

## Dijberên Kurdayetiye ji xemsariya berpirsên hikumeta Kurdistana azad û bêtifaqiya rêvebirên civaka Ezdî fêdedikin

Ji ber ku gelek kes û rêberên me Kurdan nêrînen xwe li ser bingehên buyerên ku van rojên dawiyê li Şêxan, Mûsilê û li derdorên wê çêbûne anînine ser ziman û min jî gelek caran ev pirsgrêkên bingehî di gotarên xwe yên hatine weşandin de anîne ziman, niha naxwazim çarîne zêde li ser wan pirsgrêkên bingehî buyeran rawestim.

Tenê, ez dixwazim van çend dîtin û pêşniyariyên xwe jî dîsa bi kurtasî bibêjim

Bi dîtina min, divê rêberên hikumeta Kurdistana azad, wan kes û oldarên Kurdan yên ku me û zarokên xwediyên axa Kurdistanê bedidine hevûdinê û me Kurdan ji bona menfêata fanatîzma xwe jihevûdinê dûrdikin û bihevûdinê didinekuştin, hêjî baştir nasbikin. Heta ji wan bê, rojek berî rojekê destên wan paşverû û olperestên nezan ji nava rêberîtiya netew û civaka me derxînen. Di zagon û desthilatdariya Kurdî de ferzbikin ku hemû rêber û oldarên Kurdistanî ji nasnama xwe ya kurdbûnê re xwedî derkevin û eşkere li her derî, ji her kesî re bibêjin kurd, kurd e çî misilman, çî êzdî, çî kildanî, û hwd.ê .

Ez li goriya zanîna xwe dibêjim û dibînim ku rêvebirên meclîs û civaka Êzdiyên li Kurdistana azad de dijîn, hêjî nikarin li goriya Êzdayetiya resen xwe û civakê bi rêxistin bikin. Ne şixwe, gava bandora wan rêber û ruhaniyên me li ser civaka wan e Êzdî hebûna, ewan doh ne dihîşt ku hinek „endamên“ wan li goriya rê û resmên olên xerîban zarokên Êzdiyan bikujin. Ewqas ferman bi serê bav-kalên me Êzdiyan ve hatine û zilm li wan buye, hîna kesî di tu bedîlan de ne bihîstiyê ku Êzdî keçên xwe weha bi awayekî hovane kuştine.

Li goriya dîtina min, li ser van buyeran nêrîna xuşka nivîskar **Sîdar YÎGÎT** gelekî hêja ye û dibêje: „Bila kesek xwe nexapîne. Mesele ne hema meseleya keçeke êzdî ye. Kiryarên wiha olan nanasin li welatê me. Keçên misilman jî, yê êzdî jî (û yê elewî jî) dibin qurbana vê şiddetê.

Keç û jin hema wiha ji nişka ve nayên kuştin û ji reflekseke bêfikir xwe nakuvin. Mekanîzmayên civakî rê li ber bûyerên wiha vedikin. «Kuştinên namûsê» (yan jî di bin çî navê din de dibe bila bibe) encama herî tûj ya civaka jinçewisêr e...“ berdeyam di <http://www.netkurd.com/gotar.asp?yazid=104&id=1229>

Ez jî dibêjim, gelekî pêwîste ku berpirsên hikumeta Kurdistana azad û yê civaka Ezdî çî li nav û derveyî welat de, tev bi hevûdinê re wan kesên ku ev xuşka me qetilkirine bigrin û teslîmî ber destên rêvebirên desthilatdariya Kurdî bikin. Û nehêlin êdî tu kes van wahşetan bi navê dîn û tucarî bi navê Êzdiyatiyê bikarbînin.

Li aliyê dinê jî ez bawer nakim ku ev pirsgrêkên vêga li Kurdistanê, di nava Kurdên êzdî û misilman de peyda dibin û hene ji aliyê hêza van „reşenbîr“, „rêvebir“ anjî „tifaqên“ mal-komelên me Êzdiyên li derveyî welat xebatê dikin ve jî çareser bibin.

Ez nizamim ka van „rewşenbîr“, „rêvebir“ û „tifaqên“ mal-komelên me Êzdiyên li derveyî welat de ji çend pirsgrêkên helandin û asîmlasiyona ku vêga em û zarokên me li ewrûpayê di dinav de difetisin re çareserî dîtine?

Vêca gelfî xuşk û birayên Kurd, divê em hevûdinê ne xapînen û bizanîbin ku pêşiyên me ne beredayî gotine “kî ne li şere, ew şêr e” anjî „Şam dûre, qey mişar jî dûr e“.

Wekî ne derew be, bila ev kesên ku niha li ser bişkokên computerê, di nava çar dîwaran û di bin ewlekariya dewleta em tê de ne, xwe pispor û zane dihesibînen, kerem bikin herine Kurdistana azad û endamên civaka xwe birêxistin bikin. Kî rê li ber wan girtiye?.....

Dîtina min xwe ya dawî dibêjim, heta berpirsên hikumeta Kurdistana azad û yê civaka Ezdî (çî li nav û derveyî welat de ne) yan, di derheqê pirsgrêkên ku nakokiyên dixine nava gelê Kurd de xemsaribin û li hemberî dijberên Kurdayetiye hevkarîyeke xwe ye bi rêk û pêk çênekin, wê aşîfî û demokrasiya li Kurdistanê jî bi ser nekeve.

Ez weke kurdekî êzdî hemû qetliyamên terorîstî û bi taybetî jî yê van rojên dawiyê ku li Mûsil û derdorên wê çêbûne bi tundî şermizardikim.

Dibêjim, bila serê hemû kesên malbatên şehîdên Kurdan sax be.

Şikir ji Xwedê û van destkeftiyên Kurdayetiye ye hêja re!

Oldenburg 24.04.2007

Kemal Tolan